

HEJMAR
32

pîn

%100
KURDÎ

KOVARA QERFÎ Û WÊJEWÎ

kovara qerfî û wêjeyî ya nîv mehî 16-28 şubat (reşemî) 2001 Sayı: 32

600.000 TL

YEK-DO...YEK-DO!
EZBENÎ! MERA KU
DÎGE YEKÎTİYA
EWROPAYÊ GIRT!
BAŞ E!

ŞERFIROS Û ŞERXWAZ JI BO KU
CARDIN ŞER DERKEVE, LI KEYSÄ XWE
DIGERIN! PIŞTÎ KUŞTINA GAFFAR
OKKAN, RÊVEBERÊN HADEPÊ YÊN
SILOPIYÊ SERDAR TANIŞ Û EBÜBEKİR
DENİZ, LI PEY BINÇAVKIRİNÊ, HATIN
WINDAKIRIN.



BENAV Û ÇİÇEK

Pînka pînqeyê

MAZLÜM DOĞAN ■ ■ ■

MOLA!..

"... Û ez gunehkarê herî mezin im, ji ber ku min zimanê dayika xwe ji bîr kir!.."

EW (LI HEKARIYÊ WERZEK) FERÎT EDGÜ

Ezbenî, ka pêşîn herin qedehek av bînin deynin ber xwe, paşê vê nivîsê bixwînin!.. Kurterê, bi sê telaqê bêfitû, em dev ji Pîneyê berdidin (*Tu dibê qey me zarokê xwe li ber camiyê daniye!..*) Li gorî plan û bermameya li dar, emê êdî Pîneyê mehê carekê, lê rûpelê wê zêdekirî derxin!..

Mehanebûna Pîneyê, bêguman bêhtir ji ber astengî û kelemên *Roma Reş* in!.. Ne ji van be, Pîne, hema bêjin, wê bi tîraja Amedê li ser piyan bimîne. Lê dîsa jî, ger em ji dil bin, ev kelem, kerengên li ber bê nel!..

Serqise; gelê *Kosowayê*, di bin gulebaran û bombebaranê de, tûnel kolandin, da ku tê de bi zimanê xwe perwerdehiyê pêk bîne.. Lê zarokên me yên ku li malê bi kurdî dipeyivin, li saziyan zimanê xwe ji bîr dikin; hin jî di girtîgehê de ji bîr dikin!..

(Türkçe Konuş Çok Konuş!..)

Diyar û xuya ye, em hê ji kurdayetiya xwe ne xweş in; kurdî 'zimanê çiyê' ye; em "tirkên şermoke" nel.. Hin rêveberên me li gala, kokteyl angò "cihêl lûks" bi me re kurdî napeyivin!.. Û zarokên hin pêşengên me jî, nizanin bavê wî/wê di rojnameyeke kurdî de nivîsiye; hay ji rojnameyê nîn in!..

Li aliyê din, tiştê dilsoj û diltezîntîrin jî li salvegera "15 Reşemiyê", hildana biryara mehanekirina Pîneyê yel!..

Bêguman ev ne têkçûn û binketina zimanê kurdî yel.. Lewre zimanê kurdî her tim li deplasmanê dîlîze (*Jixwe hakem yekcar qûnde û bêbab e!..*) Ger rojekê zimanê kurdî li sehe û li ber temâsekarê xwe bilîze, wê malê li yekî xira bikel..

Her wiha, ji bo ku temâsekar zêde werin maçê, divê mirov baş bi topê bilîzel.. (*Yanî em jî ne çira şîr in!.. Kêmasiyê me jî hene!..*) Lê di serî de piştigirî û alîkariya gel û taraf-daran pêwîst e!.. Lewre mirov nikare li ber trîbûnê vîk û vala li maçê sor bibe û piştî demekê dev ji xwe berdidel.. Merheba ji we re!..

Heyran, Şaxa HADEPÊ ya Stenbolê pêşbirka karîkatûr, kurteçîrok, helbest û nizanim ci saz dike, camêr û canikêñ ku dixwazin beşdar bibin, bila heya roja 5 adarê berhemên xwe bişinin ser navnîşana şaxa Stenbolê!.. Silav û hurmet!, Tel: 0 212 225 15 07-296 11 96

RIZO - DIZO



DOZO



BİRECÂN



MELE



EŞREF MUMCU



SOSRETİK




EŞREF MUMCU

Serfermandarê Artêşa Tirkîyeyê Kivrikoglu got:
"PKK'yiyên ku ji ber efûyê derketine, divê li derve bêne şopandin!.."





Wezarata Edaletê, ku soza milê (kol) protez dabû Veli Saçılıkê ku li Girtîgeha Bûrdûrê milê wî hatibû jêkirin, bi cih neanî.

Dadgehê ceza li Çeteya Sûsûrlûkê birî, lê ji bo kirin û súcen wan xwe li koriyê danî!..



Diyar bû ku simbola MHP gurgeboz (Bozkurt), bi eslê xwe bizin bûye!..



Amîrê Kargeriyê yê meclisa Tirkîyeyê yê MHP'yi Ahmet Çakar got, "Palkursiyên ..., me har dikin!..")



Dewletê ji bo ku girtî dev ji ROJIYA MİRİNÊ berdin, pirtûk û top li wan belav kir!..



Alpaslan Türkeş, ê ku xwe wekî çira şîr dida xuyakirin, trîyoner derket!..





MURAD BATGI

Ku dayikekê res girê da li pey ciwanê/a xwe:

Res girê dide dilê min!

Ku yarekê, zérên xwe yên Resadî ji stûyê xwe derxistin û res girê da li pey hezkiriyê xwe; Res dibînin çavê min!

Ku dengbêjê welatê mîn dest avêt guhê xwe û dest bi çiroka Siyabend û Xecê kirin;

Res dibihîzin guhê min!

Ku zarokekî li reşgirêdana diya xwe nîhîrî û hêstir barandin;

Res dîbarin hêstirêñ çavê min!

Zeman res, ewr res, xewn û xeyal res!

"Pêşepêşeroj" res, stêrk res, zer res, spî res!

Hemû rengê li ser tabloyan,

Hemû gul û nesrînê li nav gulistanan res!

Ava Kewserê res, roja sibehê res!

Tîrs û cesaret, ês û dilşadî res!

Libendêman û cûyîn serkeftin û têkçûvin disa res!

Ü jîxwe esq tev de res bûn li vî wela!

Erê! Min zanibû ku hemû gînîn res in, tê vê carê jî res dikene zarokatiya min.

Ü niha hemû helbestên Cegerxwîn res dixwînim!

Ü Şerefnameya Firdewsi û evîna Mem û Zînê res dixwînim!

Bi pênuşa Feqiyê Teyran, Melayê Cizîr, Goran, Hejar û heta Şerko Bêkes, qedera me ji nû ve res dinivîsim!

Ü dîroka Merwaniyan û bêbextiya van Romiyan!

Ü hemû stranêن Sîvan û Ciwan res distirêm!

Niha dixwazim hemû dilê xwe birêjim ber destê we, binivîsim û bixime nav reşbelekekê û bişînim "Reşistanê."

Niha bi sê rengê res dibînim ala pîroz; "reşekesk", "reşesor", "reşezer"

Niha di nav heft rojên res de dijîm; "Reşeşemi", "dureşem", "sêreşem", "çareşem", "pêncrêşem" û "reşîn".

Ü ne tenê saet û roj û heyv, her wiha demsal jî res in niha; "respayiz", "reşbihar", "reşhavîn", "reşzivistan"...

Ü belkî jî ew roj hatiye ku res ketiye dilê me... Yan em dê ji nû ve res girêdin û yan jî em dê şer girêdin!..

SELPAK

REWHAT





ŞEKIRÊ QULQULİ

CEM ŞEKER

LI TELEFONÊ TÊ GUHDARÎKIRIN!..

Mirovên ku zanin bikenin û bikenînin, wê bi ser bikevin. Tu xêr di rûyê mirovên rûtîş de nîn e. Kî maskeya cîddiyetê bi rûyê xwe ve dike û kenandinê mîna sivakahiyê, eblehiyê û heynikbûnê dibîne, bila hûn bizanibin mirovên herî kêmeqil ew in. Diyê mirov bikaribe tehliyê şêrîn bike, ji êşê xweşiyê derîne. Ne zehf bin jî, mirovên wilo di nava me de hene. Yek ji wan jî, *Celalettûn Erkmen* serokê berê yê HADEP'ê yê Rihayê ye.


Rojekê ji rojan, ji bo çalakiya partiyê, wê li Rihayê karwaneke tirimbêlan saz bibe û wê di nava bajêr de tûrekê biavêje. Gava karwana tirimbêlên HADEP'ê di nava bajêr re derbas dibe, dê weledê xwe davêje; ji heft saliyan heta heftê saliyan, her kes derdikeve, bi çepik û lîlandinê erd û ezmên dihejîn. Tiliya xwe ya eşhedê û ya navê mîna qiloçen bizinan rep dikan û dibêjin: "Bijî... bijî!.."

Berpîrsiyarên ewlakariyê hem ji çavnebarf û zikreşiyê û hem jî ji ber ku karê wan ê wê rojê zehftir bûye, aciz in. Ger fermandarê wan destûra êrîşê, lêdanê û binçavkirinê nedabe, dikevin tengasiyê. Heta ku ji destê wan tê, dixwazin karwan biçûk be, riya wan kurt be û karwan li derveyî bajêr bimeše.

Fermandarê ewlekariyê gazî Celalettûn dike, dibêje, "Wê çend tirimbêl tev li karwanen bibin?" Celal dibêje, "Qet meraq mekin, min yek bi yek telefonî her kesî kiriye ku, tu kes neyê çalakiyê. Emê vê carê hindik bin!..." Ken û kêt li rûyê şef belav dibe. Dibêje, "Dîsa jî bi texmîna te wê çend tirimbêl werin?" Gava Celal dibêje, "Ez bawer nakim, ji şes sedî zehftir be" çavên şef ji cih baz didin.

Dîsa rojekê, li partiyê tevgerek, çûn û hatinek heye. Şefê polisan bi çendek zilamên ve xwe tê partiyê, da ku fêhm bike ka ci diqewime. Partî bi mirovan mişt e. Şef, ji Celal dipirse, "Hûn amadekariya çalakiyeke bêdestûr dikan?" Celal dibêje, "Na, em tenê sohbetê dikan!.."

Şef û hevalên wî çaya xwe vedixwin û cixareya xwe dikşînin. Şef rihet dibe ku tu çalakî tuneye. Dixwaze agahiyê bide navenda polisan, ku tiştekî bi xeter nîn e. Şarza bêtêla wî qediyaye. Ji Celal re dibêje, "Ez dikarim telefona we bikar bînim?" Celal dibêje "Ser çawan, ne dêmax!.." Şef ber bi telefonê dimeşe, Celal dide dû. Mîna ku di guhê şef de bibêje, lê bi dengekî bilind dibêje, "Eman şefê min, tu yê bi telefonê bipeyivî, dîkkat bike". Şef dibêje "Çima?" Celal, "Telefona me tê guhdarîkirin!.." Pirqîn bi gel û bi şef dikeve.




ŞEND REXNE, LI SER TİRAJA PİNE

A. GİGEC

ONIED
Umur HOZATLI

umur.hozatli@operamail.com.



TAWA VİNDİKERDENƏ

Rocî kutû pêser amayî serê rindiya ma. Halê ma çığa rind bi kê zulim anca ama kut çêberê ma?

Çayê niya beno?..

Çayê berbayış anca kuno ma?

Xeberê kê Sîlopî ra ama, pênyiyê belî bî. Heta nika kamkê gurotî zere vatî "ma dê çîno" ïnayî kîstî. Henî kîstî kê zere û loqiran vêtî teber...

Nika anca qisawete kêwt zere ma. Sîlopî dê se beno?.. Mêrdîn dê se beno? Amed dê se beno? Kuş vanan, welatê ma dê, itâ dê, her ca dê, dot dê, her ca dê, na cara tepiya se beno?..

Di-hîrê serî ra tepiya anca merdayış û zulim peyser yeno...

Nika anca tawa vîndîkerdena!..

Çayê kuş ma vîndî kenê?..

Çayê kuş ma vîndî benîmê?..

Kutikî têyna nêlawenê. Vergî têyna nêfetînê. Verê ïnan dê ma çayê teynayî mî?..

Persan pers kenan...

Çayê pers kenan?

Zerê min qurfino ayra pers kenan. Teynayîne ra tersenan ayra pers kenan. Nêwazenan kes vîndî bo, kes bimiro, ayra pers kenan... ..

Henî aşîno kê anca yene ma ser.

Henî aşîno kê wazenêkê ma qir kîrê.

No belî yo.

Ma aşîyê wazenîme, ïnayî gonî wazenê.

Ma rindiyê wazenîme, ïnayî tertele wazenê.

No aseno.

Ekê henîyo ma se bikimê?..

Mordemo pîl vano, "ma heta pênyiyê pînimê. Aşîyê ne texelînîmê!" Rind vano ïnayî dişmeniyê kenê, goş nênanê ser. Niya kê beno mordemo pîl se kero, gerîla se kero, ma se kîrîmê... ..

Taw anca bî tawa vîndîkerdenê, tawa merdenê. Ekê niya şono, dişmeniyê anca berz beno, kam se bikero?

Tertele dûr niyo!..

Hema ma wazenîm aşîyê daîm bibo, birayînê daîm bibo.

Heskerdenê bibo...

Heqaniye bibo...

Serbestî bibo...

Taw tawa vîndîkerdenê mebo, dirbetiyê mebo. Taw tawa birayînê bibo!..



EŞTEWIS

SEFER SEÇİ



GIRARA QEREÇİYAN

KOKA MÊRANIYÉ!..

Kî dizane mêranî çawa bi mirov re çêdibe? Carekê min bingeh an koka méraniyê nas kir, bê ji ku derdi keve û deryaya méraniyê li ku ye. Di cûnên min yên cem ciwanmîrên *Muxaberatê* de, carekê, ji nişke ve, min ev yek keşf kir. Li *Helebê* serê hefteyê carekê, yan ez diçüm cem wan yan ez dibirim cem xwe; ferq tuneye. Anglo her pêncsem, di wê demê de, ez wekî mîxekî (bizmar) li ber deriyê wan disekinîm.

Vêca di odaye biçûkik de ya li bendemanê, kezeba min û bavê min reş dibû. Di çend carêñ ewîlî de min nas kir ku ez saet û nîvîkê, ne deqeyek zêde ne jî kêm, divê ez di vê odaye de bimînim. Heta ku dora min bê û çend pirsên ku hezar carî hatine dubarekirin ji min bi pirsin, sêzdeh sûret, nozdeh

pê dirêjbûn û tiştê odaye m dihejmartin.

Di nav re, h qeyan yekî ser xist û li min c min nîvco dim bang li min di deh caran di h riyan xwe de ya herî xwes, *tehqiç* bû. Der kir, min zanîbî nêzik dibe.

Mesele wel bi ciwanmîrî wan dosaya dereke din. Li tim odayeke Saet û nîvîkê ra min hat. Dihatîm ku bi saet û râ dihat ku di derkeve. Ev daqurtandin. min nema karîta. Kîskê avê di gên min de dih

TABLÊTÊN

YAWABE!... KA KARÊ KU EM
DIKIN KARÊ İNSANAN E!.. MA HER
WÊ DESTË ME WIHABE? MIN TIŞTEK
JE FÊM NEKIR HEYRAN!..



du derî û her
in sed caran

er çend deqî
e xwe derdi
pirsî. Bersiva
û diçû. Heta
rin, ez sêz
mû sax û mi
ramiyam. Lê
vê cûnê de
a dest pê di
ku êdî dawî

hûn dibînin,
meşıya, heta
nin bilind kir
samê ez xis
ekî ya berê.
nema seb
saet cûn, ez
ehecim. Du

kezeba min
evê min re
ev de dihat
sê saet cûn,
ô xwe ragir
nav her du lin
at ku biteqe.

BEREDAYÎ




MECİDO JI VIR
MANZARAÇI XWEŞE!
KURO DİNO! ÇİMATU
Jİ TEMEŞA NAKI!..

Ê, MECİDO JI XWE RE
MANZARAYEKI WIŞA HÉJA
DİTİYE, KU EDİ BİMIRE Jİ
NE XEME!.. HEY XWEDÉYO
TU ÇIOAS MEZİN!.. EV
TORPILA TE YA JI MECİDO
RE TU CAR NANĘ JI BİR
KIRIN!.. ZOR SPAS!..


HIŞ GARSON!.. HA Jİ TE RE Vİ
GOŞTI BIQELINE!.. SİFREYÉ AMADE
BIKE!.. MAQEY EVQAS AGIR BEREDAYI
DİŞEWITE!.. EM İŞEV SERE XWE GERM
BIKIN!.. KASETA MÜSLİM Jİ DEYNE SER!

GI?
ERRIK! RAKE
SERE
TERRIK!..




XALO, DAWETA WE
QEDIYA!.. TU DIKARI
DAWETE JI BO ZIRT TV
YORIMLAMIS' BIKI?!..
ÇAWA DERBAS BÜ?!

WELLEH ALIYÉ BÜKË Jİ BI
TÉKOŞİNEKE MEZİN LIBER XWE DA!..
LÉ LİSTIKVANEN ME ZÈDE JI XWE
BAWER BÜN!.. LOMA DAWİNÉ SKOR
JI ALIYÉ ME VE VEGERİYA!.. EZ REQİBË
MEJİ PİROZ DIKİM!.. LÉ KONDİSYONA
WAN KEM BÜ'L MAXLÜPBÜN!..




ABÉ, HÉ SİFTEHA ME
GENEBÜ!.. TU DIXWAZİ
EM DEV JI Vİ KARİ BERDİN!
MA Bİ BÜZDOLABIYÉ GET
DASIR, GEDİBE!?



DELALA MIN! İRO KOJA
EVİNDARAN E!.. MIN Jİ TE PESTİR VEKE
BI QEDR Ü QIMET LI Vİ BAJARI NEDİT!..
TU EVİNDARA MIN A PESİN! MA EZ TE
Jİ BİR DIKİM!..





BÜZDOLABI: SARİNC. YORUMLAMAK: ŞİROVE KIRIN.





CIMA?



RÛMET DÎSA RÛMET!...

Pencereya Peyvê

ahmad.hussayni@nefel.com

EHMED HUSEYNÍ



Mamosteyêk payebilind ji mamosteyên zanista derûnî (psîkolojî) li wanexaneyê ji şagirtên xwe re yên ku bijîskî dixwend, li ser peywendiya di navbera laş mirov û giyanê mirov de dipeyivî, şirove dikir û digot:

- Bi her hal, laşê lawazî û nexweş ji bo şesbûn û peydabûn û êrişa nexweşiyên derûnî çeregeh û meydanekî vekirî ye. Her ku laşê mirovan ji aliyê tenduristiya xwe ve têkçûyî be, ewqasî jî gengaziya lêş heye ku pêşwaziya nexweşiyên derûnî bike. Berevajî vê çendê jî, derûneke nexweş dibe sedema lawaziya laşê mirovan. Peywendîya di navbera her du aliyan de, peywendiyeke gur û germ e. Her du alî şûnşopên xwe, bandor û akamên xwe li hev dikin.

Hê mamosteyê me, peyva xwe bi dawî nekiribû, berdestkê wî digel mirovekî gundi, bi lez, derbasî wanexaneyê bû û tika kir ku çareyekê ji rewşa yê gundi re bibîne.

- Ci pê hatiye? Mamoste ji berdestkê xwe pirsî

- Stirî ketiye çavê wî Seyda

Kêfa yê mamoste pir hat, yê gundî ber bi xwe ve kişand û ji nişkê ve, li ber çavê hemû şagirtan, sîleyeke dijwar li nav guhê wî xist. Yê gundî ji hinavên xwe ve keliya, şîn bû, lerizî, zimanê wî li hev geriya, çûrîskên êgîr ji çavên wî ber bi mamoste ve dicûn.

Dîsa, ji nişkê ve yê mamoste qîriya û jê re got, "Raweste, xwe neliv-îne..." Rahîste mûçîngä xwe û bi serê wê, stiriya ku ji ber hêrsa yê gundî serê xwe derxistibû, der anî. Lêboñîna xwe ji yê gundî xwest û li şagir-tan zîvînî:

- Ew peywendiya ku em li ser dipeyivîn, aniha we bi çavêن serê xwe dît. Ew gundiyê ku ji bilî rêz û rûmet û namûsa wî tiştekî wî nîn e, sîleya min ji bo wî riswayî û bêrûmetkirineke mezin bû, li jêr bandora vê hestê, velerzîneke bêsînor di kesayetî û hebûna wî ya derûnî de dirust bû, ku êdî hêrsa wî besdarî dehfdayîna stîrî bû. Vê nimûneyê ii bîr nekin!

Bi salan re, şagirtên bijîsk xwendina xwe kuta dikin û her yek ji wan dest bi karê xwe dike. Rojekê ji rojan, berdestekê bijîşkekî ji wan, bijîşkêñ ku dema bûyera yê gundî li wanexaneyê amade bû, digel nexweşekî, bi lez û bez, derbasî cem ê bijîsk dibe û jê re dibêje;

- Seyda, derzî di çavê vî nexweşî de şkestiye, rewşa wî pir aloz el..
Lewra min ew berî hemû nexweşen dîtir derbasî cem te kir.

Bijîşk rabû ser piyan û ber bi yê nexweş ve çû û ji nişkê ve sîleyek ji ya mamesteyê xwe tûjtir û dijwartir li bin guhê wî xist. Lê mixabin ê nexweş hîc di xwe demexist. Sîleyeke din, lê ne hejiya û ne ji sor bû. Sîle li pey sîleyê bi ser de bariyan, lê nexweşê me hîc giringiyê nade vê bareyê.

Bijîşk bi destê wî girt, berê xwe da mamesteyê xwe û jê re got:

- Derzî di çavê vî nexweşî de şkestiye. Min ew bi sîleyan herfand, lê hîç né xema wî ye.

Mamoste li bejn û bala yê nexweş temaşê kir. Taximekî reş, porekî şehkirî û biriqandî, gumlekekî spî û qraweteke sor î zirav.

- Taximê te ne xweşik el... Hîç guncînek di navbera gumlek û qraweta te de nîn e.

Mamoste jê re got û ji nişkê ve cawbira ku li ser maseya wî bû avête keviya qrawetê û birî. Yê nexweş, êdî, dest bi kefteleftê kir û laşê wî dest bi velerzîn û hêrsê kir, hetanî ku serê derziyê ji çavê wî derket û yê mamoste müçinka xwe avêtê. Li şagirtê xwe yê bijîsk zîvirî û got:

- Kurê min, ne her kes mîna yê gundi bi sîleyekê tûre dibe. Hin kes rûmeta wan bi sîleyekê têk diçe, wê gavê mirin ji wan re xweştir e. Hin kes jî rûmeta xwe wek nexweşê me yê dawîn di qraweta xwe de dibînin. Gerek tu cihêrengiya mirovan nas bikî.

Îca kurdêñ vê sedsalê, yên ku her gav û saet, rûmeta wan bin pê dibe, xewna wan ziwa dibe, zimanê wan berbat dibe, xwerista wan dişewite, mirovên wan diqurmiçin, hiş û bîra wan tê dizîn, dîroka wan tê nixumandin û çanda wan a neteweyî tê bişaftin û helandin, dê çawan, bi ci û bi kîjan sêweyê raperin, tûre bibin û bilerizin!!!!



namedank!..

DE WERE SAFÎ BIKE!..

Mazlûmê bira,

Biraziyê te Hebûn û sal li pola (sini-fa) duduyan dixwîne. Silavan li te dike û tê rûyê te. Tu jî dizanî, ew xwendevanê Pîneyê ye. Kurmancî baş nizane (zaza, têjikê qaza). Ji min dipirse:

- Ba...!
- Ha baba min.
- 'Sator Aşî' zî ê Apê Mazlûmî yo?
- Erê..
- Baba, ez bikutim te, ci yo?
- (Ahal! De bêre safî ke. Rî min bi sûrî!)
- Nêzana!!!
- Ti nêzanê, Apê Mazlûmî ra pers ke..
- Wa bo!

★ ★ ★

Jixwe te wêneyêne wî neşandîn! Qet nebe wateya van peyvîn li jêr di hejmara bê de binivîse, da ku biraziyê te Hebûn baş fêr kurmanciya me bibe!

Mînak:


Bilikyûûs! Guni kistan! Qeh-poxlî qehp! Lawo li diya xwe siwar bibin! Qûna me jî heye oxlim! Seyfî Qûnmezin! Hinek yawşax qûna wan dixure! Na qûna wî mezîn e, an na gîlo-ver e..! Yê ku pirtûka min rexne mexne bike kerê dinya alemê li diya wan siwar bibe! Ev orispînîn ewlad! Lê qûne-kê xwediyê min nahêle ez keçekê bînim malê û lê siwar bîbim! Qûna min bîrrîne! Zû

qûna min bînin! Li ku ye qûna min a delal! Qûnê! Ji zotikê derdikeve! Ulan qebraxlar! Gilover Misto bi kerê sa dibû! Erê Misto erê te xwar xi-re kerê! Ji qûnê davêjî! Qûna te ew-qas îlhamê ji ku distîne! Ev qûna te qet naweste! Tu qûna xwe li ku sarj dikî! Bi rastî 1000 şarj têra vê qûna te nakîn oxlim! Agir ketiye zotika min eman yeman! Navranguzel! Qu-zîlqurt, hûn qûna xwe jî nazivîrîn! Ezê bikutim te ha!

Ev hemû di hejmara dawîn a Pîneyê de ne. (Nizamîm hejmara çendan e.) Ji me re wekî 'Sator Aşî' hat. Hela hela! Sator û Aşî?! Tijî qûn bû...

ROŞAN LEZGİN / AMED

Not: Ger tu vê nameyê biweşînî, tu peyvek jî jê derbixî, tu xêrê ji qûnan nebînî!..



1- Dost û hevalbendê kurdan bû, lê xwestin kuştina wî bixin stûyê kurdan, lê bi ser neketin. Navê serokwezirê Swêdê yê ku di sala 1986'an de hate kuştin. - Di mîting û meşan de, hema bêjin, serê her hevokê tê bikaranîn. 2- Navê wênekêsekî ermenî yê Tirkîyeyî (0533 de bakanym!..) - Dayika hemû

kurdan bû. Di sala 1998'an de li Almanyayê gorbihuşt bû. Yanî navê hevala Qazî Mihemed 3- Navekî jinan, ku bi dehan stran li ser hatine gotin. Dema şev sar be radîzê!.. - Dengê qirîna hespan. 4- Diya berxikê (berepaşkî) - Xaniyê çivîk û mirîşkan 5- Dengê zirîna birêz Çarsim Axa (berepaşkî) - Paşnavê gokbazekî Galatasarayê, ku serê xwe rût kiriye (Heval süreç değişti!.. Böyle sorulara hazırlıklı olun!..) 6- Notayek - Sola hesp û hwd. angô destebirakê bizmîr!.. 7- Qumareke qanûnî û neteweyî; ji bo ku kel û hêrsa belengaz û xizanan bê vemirandin, pir bikêrhatî yel.. Yanî tirata hespan. - Nêra lê!.. 8- Dema yek van dike, jê re dibêjin, "berde binê te erd el!.. - Berê me bi hûcik angô çilanê (yen) xwe paqîj dikir, iro bi selpakê dikan; cilm.

★ ★ ★

1- Li gorî racona Qirix û pêxwasan dema ya sola yekî ne şkestî be, guneh e û sedema aforozkirinê ye. - Camêr û canik li keviya behrê, xwe didin ber û qemer dibin!.. 2- Tîstê ku ji her kesî zêdetir ji kurdan re pêwîst; hizûr - Bi devokî cinavka tu. 3- Kurdên ku behr dîtine. - Hin kes hesp tuneye çedîkin; sêni û xwarindan-ka sewalan. 4- Belaya serê kurdan, kula ser kulan; eşîr - Kesk û sor û zer e, nîşana zafer el!.. 5- Cînavkek - Kar, xebat. - Daçek. (Heyran nebêjin, ev daçek ci ye, herin li pirtûka Samî Tan binîhîrin!..) 6- Li Çiyâyê Araratê agirê serhildanê geş kir; bi tenê navê wî. 7- Welatê kurdan jixwe wisa ye; cephe. - Paşnavê dozgerekî tirk, ku operasyona "eneriya spî" pîrsîyar dike. (Qesem bi navê xwedê, paşnavê wî bê hemdî me kete vir!..) 8- Karê Pîne-dozan (mala minel!..); henek, tinaz. - Nêra lê.

1 2 3 4 5 6

PEYVA İLLEGAL

Deh kesê ku peyva ilegal bibînin û bişinîn ser navnîsanâ Pîneyê, wê kaseta KOMA AGIRÎ HEWLÊR qezenc bîkin.

Kesên ku kaseta KOMA BERFÎNA BESTA LORÎNA RE qezencirinê ev in: BENGÎN BENGÎ/ MELETÎ HASAN AYDÎN/ BATMAN, REMZÎ KOLHANLI/ RIHA

Ji Weşanêñ Welat bixwazin

Amed
Kıbrîs Cad. Türk Hava Kurumu Apt.
Kat 4. Tel: 412 223 34 83

Van
Belediye İş Merkezi
Kat 1. D 106
Tel: 0432 215 64 26

Batman
Yeni Mah. 711.Sok.
No: 27 Kat 2
Tel: 0 535 319 46 15

Riha
Kunduracılar Pazarı, Özpolat İşhani. Kat 3/5
Tel: 0414 216 81 07

Edene
Kocavezir Mah.
Karacaoğlan Cad.
Aziz Pamukçu İş Merkezi
Kat 3. No: 23
Tel: 322 351 42 78

İzmir
1420 Sok. Koyuncular
Apt. No. 12. Kat 5.D.5
Kahramanlar
Tel: 232 446 19 50

Mersin
Çankaya Mah. 4709 Sok. Eser işhani Kat 1.D. 5
Tel: (0324) 237 66 49

**Serhildana
Mala Eliyê Ünis**

PIRTÜKA MAHMÛD BAKSÎ YA DAWÎN 'SERHILDANA MALA ELIYÊ ÜNIS' DERKET

Kovara panzderojî (Onbesgûnlük Dergi)

Xwedî (İmaliyaz Sahibi) M. Nuri Karakoyun
Koordinasyon Gözü: Samî Tan
Lijneya Weşanî (Yayın Kurulu):
Mazlûm Doğan, Doğan Güzel, İmam Cici

Berpirsiyare Karê Nivîsaran
(Yazî İşleri Müdürü) Abdurrahman Pekedis
Navîsan (Vönelim Yeri) İstiklal Cad. Ayhan
İşk sokak.19/1 Beyoğlu/İstanbul

Tel: (212) 292 72 70
Fax: (212) 251 95 85
E-Mail: pinedank@hotmail.com
Kargerf (İdare) (212) 251 79 37

Çapxane: Aspaş Matbaacılık
Yayın Koordinasyon
Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd.Şti.
Belavkirin BİRTAY Dağıtım

Nûnergeh: Edene: (322) 351 42 78
İzmir: (232) 446 19 50 Mersin: (324) 237 66 49

B E Q Ên destê sibê hatine dînyê



Hevalên stranbêj!!.. Ev çend sal' in, hûn di nava komeke müzikê de kar dikin; li hemû şahî û dawetan kilam û stranên kurdî dibegin. (Sihat xwes...) Lê ev yek vê hefteyê wê bibe bela serê we, loma hêdî hêdî hînî kurdî bibin (Anlayana zimanê kur-di, anlamayana da ji zimanê kurdi.)

Q U Ş X A N E Ên berî nîvro...



Dema ku em bi we re dipeyi-vin, hûn dibêjin "Heval ez bi kurdî baş nizamim.." Lê ya rastî kurdia we, ji kurdia bavê me ji xweştir û fesîtir e. Eger hûn bi ya me bikin û hine-ki li ser bixebeitin, hûnê bikarîbin wergêriya nûçeyen Medya-TV'ye ji bikin; da ku "pêvajo nayê bivirkirin."

M O Z Ên piştî dana pez



We pirtûka xwe qedandiye, lê mi-xabin tu wesanaxane çap nakin. Çavê min serê xwe bi tişten welê neêşînin. Ji bir nekin ku, hijdeh weşanaxaneyan pirtûka Richard Bach ya bi navê Qaqlıbaz çap neki-hate wesandin, tenê li Amerikayê ji heft milyoni zêdetir hate firotin.

C A S I K Ên ber evare...



Hûn her tim simbelê xwe yê boq ba didin û dibêjin "Ku ez bi-bûma serokê belediyê, minê di nav mehekê de hemû mesele 'cözmîş' bikirana..." Hema hûn ew qas mîr bin, mesele mala xwe 'cözmîş' bikin. (Heval, tu ci di-bêj, sorun morun mala min de nîn el...)

Serê ewil, dev ji kumresi û çavnebariyê berdin û li şu-na ku hûn işev bi jîna xwe re cîk bikin, firaqan bison û şeveqê ji tastê jê re amade bikin.

Z I R N E Ên nîvê sevê...



De vêca em werin ser serokê/a belediya we. Çavê min, hûn ji wekî serokê/a belediya xwe nizanîn ka zimanek çawa dimire an ji zimanek çawa nex-weişa Ecewîtotales zêdetir di-ke. Çavê Ehmedê Xanî, Celadet û Cegerxwîn li ser we ye!..(Ey Kürt!.. Titre Kendine Gell!..)

H U D H U D K Ên heft mehî hotine...



(Disa ziman û disa quzilqurta we...) Belê we dil berdaye wê û hûn êdî di xewn û xeyalan de ji wê dibînîn. (Em ne mereqliyê xewn û xeyalîn we ne ûlanann...) Evîndara we ji wekî we bi kurdi di-zane û dikare hemû çîrokên pi-rika xwe bêrawestan ji we re ve-bêje. Lê dema ku hûn pê re dipeyi-vin, hûn bi tirkî 'qonismîş' dibin. Hey têdeskestiyoo, hey labûyo!.. Ma hûn bi kurdî biştexîlin, qey emê şîr ji we bidoşin. (Axxx, bila destê me bigihiştâ we!..)

ROJAVA Û ROJHILAT!!!..

Gelek mirov li ser pêşveçûna Rojava û lipaşmayîna Rojhilatê, wekî civaknasên biharê serê xwe diêşînin. Li ser vê pirsgirêkê bi şev û roj dikevin nav niqaşen kûr û hûr û bi têra pêncî şest bermameyên Medya-TV'ye şîroveyên akademîk dikin. (Yetkililere duyu-rulur...) Hema bêje wekî Comte, Marks û Weber analîzên sosyolojîk dikin û kumê wan davêjin Ava Botanê. Tenê şivanê gundê me mabû ku tiştek negotibû, lê wî ji kela dilê xwe berda û ji me re cudatiyên Rojava û Rojhilatê rave kir:

- * Li Rojava, her tişt bi wekhevî û mirovatiyê dest pê dike, lê li Rojhilat her tişt bi binçavkirin, cop û îşkenceyê dest pê dike.
- * Li Rojava, mirov têne qopyakirin; lê li Rojhilat vir û derewên mirovan têne qopya kirin.
- * Li Rojava, ciwan û zarok tovên pêşerojê ne; lê li Rojhilat tovên fabriqe û kargehan in.
- * Li Rojava, evîn kaniya jiyanê ye; lê li Rojhilat evîn bi tenê di nav pirtûka Mem û Zînê de tê dîtin.
- * Li Rojava, demokrasî û azadî di nav ruhê meriv de ye, lê li Rojhilat di nav gotin, rûpel û dirûşmeyan de ye.
- * Li Rojava, helbest çireya rê ye; lê li Rojhilat kî çireya xwe winda bike, helbestan(?) dinivîse.
- * Li Rojava, guherîn û veguherîn ji mîjî dest pê dike, lê li Rojhilat ji cil û bergen dest pê dike.
- * Li Rojava, bingeha civakê çand, huner û edebiyat e; lê li Rojhilat bingeha civakê, şer, qirîn, nakokî û alozî ye.
- * Li Rojava ji mirinê re derman tê dîtin, lê li Rojhilat mirin navnîşana jiyanê ye.
- * Li Rojava, teknolojî û postmodernîzm "Kanka"yê hev in; lê li Rojhilat babegîtî û post-xayıntî destebirayê hev in.
- * Li Rojava, dewlet garsonê her kesî ye; lê li Rojhilat dibe patronê her kesî.
- * Li Rojava, mifteya netewebûnê ziman e; lê li Rojhilat "Heval ez nikarim xwe bi kurdî ifade etmîş bikim!.."
- * Li Rojava, kujer û ceħş di nav filîman de têne temaşe kirin; lê li Rojhilat bi 'hunera' xwe ve di nav jiyanê de bi belaş têne temaşe kirin.
- * Li Rojava, sazî û dezgeh akademîyên civakguherînê ne; lê li Rojhilat qehwexaneyên giľî û gazindê ne.
- * Li Rojava, mirov li pey ramanê Arîstotales, Shakespeare û Rousseau diçin; lê li Rojhilat li pey ramanê Ecewîtotales, Sadamspeare û Shartoseau diçin.
- * Li Rojava, niqaş û şîrove ji çavdêrî û çavkaniyên kûr û hûr têne kirin; lê li Rojhilat niqaş û şîrove ji bo çavderx-istin û çavkorkirinê têne kirin.
- * Li Rojava, şoreş û moreş ji firaqsûstin û kincûştinê dest pê dike; lê li Rojhilat... "Keçêêêê zûka van kinca bişo û ecele ûti bike, li partiyê toplantiya min heye... nexwe ezê berê te bidim mala bavê te haaa..."
- * Li Rojava, kar û şixul bi pisporî tê meşandin; lê li Rojhilat bi korezanî tê meşandin.
- * Li Rojava, neynika civakê pêşketin, hevdûfemkirin û tolerans e; lê li Rojhilat fesadî, çavnebarî û hesudî ye.
- * Li Rojava, darbevan, diz, îşkencekar û xortûmkêş di girtîgehan de têne nîşankirin; lê li Rojhilat heman kes dibin rîveberê civakê.
- * Li Rojava, her kes di nav hewldan û xîretkêsiyê de li benda serkeftinê xwe ye; lê li Rojhilat her kes di nav tiralî û aqilfiroşiyê de li benda Godot û ferîştêne wî ye.
- * Li Rojava, paşnavê rewşenbîran afi-randin û zanîn e; lê li Rojhilat paşnavê rewşenbîran(?) karîzma û navfiroşî ye.
- * Li Rojava, şivan û dergevan fen û fitên guran baş nas dikin; lê li Rojhilat heta nîvê pez neçe, ji xewa mirinê hişyar nabin.
- * Li Rojava, mirov di trêñ û otobosan de ji rojname û pirtûkan dixwînîn; lê li Rojhilat di trêñ û otobosan de ji dikevin nava gotegot û galegalîn bin-filitî û tewteweyan.


EVDILA KOÇER

MOLA!

VÊ QASÊ BI XATIRÊ WE!

GIDÎ, VAYE
TUJÎ DIBÎNÎ.. BI VÎ
AWAYÎ XEBAT NAÇE
SERÎ... LOMA HINEKÎ
BEHNA XWE BERDE
HERE TATÎLÊ!..

TATÎLA GI
XALTÎKÊ!..
DI VÊ SERMA Û
SEQEMÊ DE TATÎL
JI KU DERKET?..



ROMA REŞ NEHIŞT PÎNE BELAV BIBE, LÊ NAV Û DENGÊ WÊ LI ÇAR ALIYÊ
CİHANÊ BELAV BÛ! LI AMERİKAYÊ BI NAVÊ PÎNE CIXAREYEK TÊ DERXISTIN.
AQÛBET LI SERÊ ME BE!

